

Evîn û Leheng: Wuslet û Firaqa Lehengî di Şahnameyên Kurdî de

Shahab Valî

Aşk ve Kahraman: Kürtçe Şahnamelerde Kahramanın Vuslat ve Ayrılığı

Öz

İnsani duyguların en önemlilerinden biri kuşkusuz “aşk” ve “âşık olma” duygusudur. Aynı zamanda aşk duygusu iki önemli kavram vasıtasıyla anlam bulur: Vuslat ve Firak. Âşık olan kimse, âşık olduğu andan itibaren, tüm varlığıyla tek bir amaca odaklanır: sevdiğine kavuşmak ve ondan ayrı kalmamak. Dünya edebiyat tarihinin önemli bir bölümü ünlü âşık-maşukların bu iki kavram (vuslat-firâk) üzerine verdikleri emek ve yaşadıkları maceralar üzerine kurulmuştur ve aşk maceraları farklı edebi türlerin önemli bir konusu olmuştur. Aşk kavramı Kürt edebiyatının da önemli temalarından birisidir ve çok eski bir geçmişe sahiptir. Aşkın farklı boyutları (kutsal/kutsal olmayan) detaylı bir şekilde söz konusu edebiyatta işlenmiştir. Kürt edebiyatında aşk ve âşık olma hikâyelerinin işlendiği edebi eserlerden biri de Kürt Şahnameleri’dir. Kahramanlık destanı olarak değerlendirilen bu eserlerde aşk, birçok maceranın ana teması olmuştur. Bu makalenin amacı Kürt Şahnameleri’nde geçen bazı aşk hikâyelerini inceleyip, Kürt mitolojik/destani kahraman figürünün “vuslat” ve “firâk” kavramları karşısındaki tutum ve davranışlarını irdelemektir.

Anahtar Kelimeler: Aşk, Vuslat, Firak, Kahraman, Kürt Şahnameleri.

Love and Hero: Conjunction and Separation of The Hero in Kurdish Shahnamehs

Abstract

One of the most important human emotions is undoubtedly the feeling of “love” and “falling in love”. At the same time, the feeling of love finds meaning through two important concepts: Reunion and separation. From the moment of “falling in love”, the person in love (lover) focuses on a

¹ Dr. Öğr. Üyesi, Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü, Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, vali.shahab@gmail.com, ORCID: [0000-0003-0580-1598](https://orcid.org/0000-0003-0580-1598).

single goal with all his/her being: to meet his/her beloved and not to be separated from her/him. A significant part of the history of World literature is based on the efforts and adventures of famous lovers and on these two concepts (Reunion-separation) and love adventures have been the sunjects of different literary genres. Teh Concept of love is one of the most important themes in Kurdish literature too and has a long history in this literature. One of the literary genres in Kurdish literarture that deals with love and love stories is the Kurdish Shahnamah. In these Works, wich are considered as heroic epics, love has been the main subject of many adventures. The aim of this article is to examine some of the love stories in the Kurdish Shanamahs and to examine the attitudes and behaviours of the Kurdish mythological/epic hero figure towards the concepts of “conjunction” and “separation”.

Keywords: Love, Conjunction, Separation, Hero, Kurdish Shahnamas.

Kurte

Bêşik yek ji hestên însanî yê herî girîng hesta “hezkirin” û “evîndarbûn”ê ye. Ev hesta evînê bi du têgehên bingehîn watedar dibe: Wuslet û firaq. Kesê evîndar dema ku evîndar dibe, bi hemî hebûna xwe li ser armancekê radiweste: gehîştina maşûqa/ê xwe û dûrnemayîna ji wê/wî. Dikare bê gotin ku beşeke girîng a tarîxa edebiyata cîhanê li ser têkoşin û serpêhatiyên aşiq-maşûqên navdar, li ser van her du têgehên (wuslet û firaq) ava bûye û serpêhatiyên evînê bûne mijara cureyên edebî yê cuda. Têgeha evînê, yek ji mijarên bingehîn ên edebiyata kurdî ye jî û di vê edebiyatê de xwedî tarîxeke pir kevn e. Di edebiyata navborî de pîvanên cuda yê evînê (pîroz/nepîroz) bi berfirehî têne behskirin. Di edebiyata kurdî de yek ji berhemên edebî yê ku rîwayetên evîn û evîndariyê lê hatine vegotin, Şahnameyên Kurdî ne. Di van berheman de evîn wekî mijareke sereke ya gelek serpêhatiyên hatiye bikaranîn ku wekî destanên lehengiyê tên qebûl kirin. Armanca vê gotarê nîşandan, analîz û nirxandina helwest û reftarên lehengê mîtolojîk/destanî yê kurdî ye li hemberî têgehên “wuslet” û “firaq”ê.

Peyvên Sereke: Evîn, Wuslet, Firaq, Leheng, Şahnameyên Kurdî.

Extended Abstract

The feeling of “love” is one of the most important and fundamental human emotions and “man” is accepted as a being in need of loveing and being loved. This feeling manifests itself in different forms: Love for a sacred Being (God/Creator-mystical/sacred love) or love for another human being. It must be said that the second type of love can also reach a sacred dimension/positoin according to its depth-reality. These two forms of love have been one of the main themes of poets/writers throughout the history of World literature. In other words, “love”, as a theme, has always been one of the most important sources of inspiration for poets/writers in different literary genres, and although the concept of “love” has undergone a change in meening in the modern period, it has maintained this central position until today. The depth, reality and sacredness of emotion of love in quetion is manifested through two concepts:

“separation” and “desire for reunion”. It can be said, the adventure of love consists of a series of stages: 1) meet/recognising the beloved (which can be direct seeing, or indirectly, such as seeing in a dream, hearing her/his qualities etc.) 2) falling in love 3) separation and 4) reunion. In “love stories”, the meaning of the deep feeling of two lovers for each other, the degree of reality and sometimes the sanctification of love between them are described through the concepts of “separation” and desire for “reunion”. The more painful, unbearable, longer the separation and the more passionate the desire for reunion, the more the depth of love is revealed. In Kurdish literature, too, love, in its various forms, is an important and fundamental theme and one of the sources of inspiration for this literature. This theme has been treated in detail by poets/writers in different genres of Kurdish literature. One of the most important of these genres is the Kurdish Shahnamahs. The main subject of Kurdish Shahnamahs, as a section of epic literature, which has a very long history in Kurdish geography, includes the adventures of Kurdish mythological/epic heroes. The adventures of these heroes are based on two basic themes: war and love. The adventures of these heroes, who have an important, superhuman and sometimes sacred position in the collective memory of the society, are based on these two themes. At the same time, these two themes are related to two different dimensions of the mythological/epic hero’s character. In Kurdish Shahnamahs, the mythological/epic hero reveals the “heroic” dimension of his character the “war” (his social duty/life), which is directly related to the homeland to which he belongs, the existence or extinction of his nation and national interests, and becomes a “soldier”, superior to normal man, ready to sacrifice his life for his nation. However, the issue of “love” passes in to the scope of “personal life” of the hero in question. Since national interests are no longer at stake in this matter, it reveals a different dimension of hero’s character. The main purpose of this article is to reveal and analyse the attitude of the hero figure in Kurdish Shahnamahs, one of the most important parts of Kurdish epic literature, towards “separation” and “desire for reunion” during his love adventure.

Destpêk

Dikare bê gotin ku tarîxa edebiyata cîhanê tu carî ji têgeha evîn/eşq û serpêhatiyên evînê bêpar nebûye. Herçend di serdemên cuda yê tarîxî de, li gorî şert û mercên dem û sîstema jiyana civakî bîrbirî, idrak û bikaranîna têgeha “evîn”ê xwedî hin ciyawaziyên be jî, şair/nivîskarên tu caran behsa evînê û ravekirina vê têgehê ji bîr nekiriye. Ev ciyawazî, ku encama şert û mercên taybet ên her serdemê ne, bi piranî dikarin di helwestên aşiq-maşûq, cewhera evînê (ilahî-dinyewî bûn), evîna li hemberî şexsekî/ê, an jî evîna ji bo însaniyet-welatî bîr dîtin. Lê herçend têgeha “evîn”ê li gorî şert û mercên civakî yê taybet ên serdema xwe û di baweriya şexsî û cîhanbîniya şairên her serdemê de bi rengekî cuda hatibe vegotin û beyankirin jî, herdem di berhemên edebî de hebûna xwe bi kûrahî nîşan daye.

Çibûn, xweza û pênaseya evînê jî hertim bûye yek ji wan mijaran ku ehlê zanistê hewl daye vê hesta taybet pênase û rave bikin. Li gorî Mewlana: “ji bo evînê pênaseyek tunebû û tuneke û tenê evîn dikare evîn û evîndariyê rave bike” (Mewlana, 1389: 9). Di ramana Platon de jî heman wate tê dîtin: “Hîn jî kesê nekariye ji bo rûmeta evînê rêzeke hêja binivîsîne” (Platon, 2018: 11). Ji ber ku “evîn” wekî girêdanekê ye ku însanan bi Xwedê ve girê dide û wekî “hest”ê qedîm (li hemberî hadîsê) tê qebûl kirin. Çawa ku Şemsê Tebrîzî dibêje: “Heq, Qedîm e. Ji Qedîmê, tiştek bi te ve girêdayî ye û ew, evîn e” (Şemsê Tebrîzî, 1369: 69). Lê dîsa jî dikare bê dîtin ku gelek pênaseyên cuda li ser têgeha evînê hatine pêşkêş kirin. Evîn bi piranî wekî hezkirina kesê/kesa din a çawa ku ew hene, tê pênasekirin, (Stuhlmann, 1987: 307).

Li gorî Platon sedema hesta “evîndarî/aşiqbûn”a di navbera du kesan de, lihevhatina rûhî, hestî û adetî ya wan e (Platon, 2018: 103). Lê tê qebûl kirin ku evîn bi awayê ku em difikirin dest pê nake û naqede (Baldwin, 1985: 234). Evîn wekî tayê ye ku bêyî îradeya însanan tê û diçe û temenek jî ji bo vê nîne (Stendhal, 1891: 12).

Ji aliyê teorîk ve têgeha evînê bi du awayên cuda tê dabêş kirin: evîna mecazî; yanî evîn di navbera du kesayetên dinyewî de, yanî di navbera aşiq û maşûq de û evîna îlahî an îrfanî; ku maşûq tenê Xweda ye û aşiq jî însan. Lê divê bê gotin ku li gorî hin nêrînan, evîna mecazî jî, eger rastîn û heqîqî be, dikare pîroz be û di encamê de bigehêje asta îlahî. Wekî Mewlana dibêje “evîn, çi dinyewî be çi îlahî, di di dawiyê de ber bi “Jor”ê ve rêberiya me dike” (Mewlana, 1389: 9).

Têgeha “evîn”ê di eslê xwe de, di diyalektîka du têgehên “wuslet” û “firaq”ê de watedar dibe. Wuslet bi wateya “gehiştina hezkiriyê xwe” û firaq bi wateya “dûrbûn û dûrmayîna ji hezkiriyê xwe”, temayên sereke ne di rîwayeta evînê de. Aşiq, ji dema aşiqbûne, ji bilî “wuslet”ê li tiştekî nafikire û di pêvajoya dûrbûn/dûrmayîne de, yanî di firaq û hîcranê de, hertim ji vê firaqê diêşe û gazinan dike. Zîra wuslet, pileya herî dawî ya evînê û tekane arezû û xwesteka

aşiqan e. Hesteke bêfrade ye ku hin caran evqas bihêz e ku aqilê wî/wê pûç dike û dibe sedema mecnûnbûna aşiq. Zîra tekane armanceke wî/wê wuslet e, yanî pileya herî dawî ya evînê. Ji ber vê jî evîn wekî dînbûneke demkî ye ku tenê bi “wuslet” an jî bi rizgarkirina “nexweş/aşiq” ji bandorên sebaba nexweşiyê, derman dibe. Lê ev nexweşî carinan dikare bibe kujer (Bierce, 1911: 202). Êşa firaqê û perîşanbûna aşiq, carinan bûye sedema nêrîn û şîroveyên pir tund li hemberî evîn û evîndariyê. Wekî mînak, li gorî Lewis evîn û evîndarî, di rastiyê de, bêparastinmayîn e û hezkirina ji her tiştî, bêguman dibe sebaba qelişîna dilî û bi îhtimaleke mezin, şikestina dilî. Eger mirov bixwaze dilê xwe saxlem bihêle, divê dilê xwe nede tu kesî, heta nede heywanekî jî. Yekane cih, li derveyî bihuştê, dojeh e ku mirov dikare ji hemî xeter û perîşaniya evînê bi tevahî ewle be (Lewis, 1960 :138-139). Di hemî rîwayetên evîn û evîndariyê de, ji bo aşiq, firaq û dûrbûn/dûrmayîna ji maşûqê xwe, wekî dojehê hatiye teswîrkirin. Lê digel vê yekê jî evîn, wekî hesteke ku neceribandina wê jî dojeh be, tê ravekirin. Wekî Dostoyevskî dibêje: “Dojeh çi ye? êş û jana nikarîna evîndarbûnê ye (Dostoyevsky, 1967: 336). Ji ber vê jî divê mirov evîndar bibe, bê tirs û bê îtiyat, bêyî ku ji êşa ku dê ji firaqê bikêşe, bitirse. Zîra îhtiyat û baldarbûn di evînê de, belkî tiştê herî kujer e li hemberî bextewariya rastîn (Russell, 1948:185).

Digel ku di hemî rîwayetên evînî de armanca sereke (ji bo aşiq) wuslet e, lê dikare bê gotin ku rîwayeta evîn û evîndariyê, rîwayeta firaqê ye û di têgeha firaqê de “evîn” watedar dibe û evîndar sînorên xwe yên hebûnê derbas dike û kamil dibe. Çawa ku li gorî Şemsê Tebrîzî, firaq dibe sedema rabûna xavbûna aşiq (Şemsê Tebrîzî, 1369: 163).

Di rîwayetên evînî de tê dîtin ku herçiqas êş û derdê firaq, hîcran û dûrbûn/dûrmayîna ji maşûq kûrtir, bêtehemiltir û girantir be, evîna aşiq li hemberî maşûqa/ê xwe, meqbûltir xuya dike. Ji ber vê yekê dikare bê gotin ku pîvana dereceya heqîqîbûna evîn/hezkirinê, êşa firaq/hîcranê ye. Herçiqas firaq dirêjtir be, êşa aşiq zêdetir û kûrtir dibe û heqîqî/rastbûna evînê tê pejirandin. Bi gotineke din, ev têgeha “firaq” û tunebûna wusletê ye ku dibe sebaba pîrozbûna evînê. Yanî, di rîwayeta evîn û evîndariyê de, wusleta dinyewî wekî dawîya evînê tê qebûlkirin. Evîna îdeal, evîna bêdawî an jî cavîd û nemir, ew evîn e ku li vê dinyayê rê nade wusletê. Nemimkuniya wusletê, evînê digehîne pileyeke din. Ev pile, pileya pakbûna ji şehwetê ye ku wekî wateya rastîn a evînê jî tê pejirandin. Evîna ku digehije vê pileyê, wekî evîneke îlahî/pîroz û di felsefeya rojavayî de jî wekî evîna Platonîk tê nixandî ku bi piranî xwedî encameke “trajîk” e.

Beşeke girîng a tarîxa edebiyata cîhanê, helbest an pexşan, qada rave û vebêja vê evîna pak û pîroz di nav aşiq û maşûqê de ye ku wekî nimûneyên îdeal ên evînê hatine qebûlkirin û nemir bûne. Eger rîwayetên evînî yên herî nasraw ên edebiyata cîhanê wekî Leyla û Mecnûn, Romeo û Juliet, Tristan û Îsolde, Hamlet û Ophelia, Şîrîn û Ferhad, Aslı û Kerem, Mem û Zîn, Xec û Siyabend bîna muqayesekirin, bi zelalî tê dîtin ku xala hevpar a ku bûye sebaba cavîdanî û nemirbûna navê aşiq û maşûq, derd û êşa firaqê, tunebûna wusletê û dawiyekê

trajîk e. Eger serpehatiya evîndariyê wekî qonaxên hevdiîtin (rasterast an nerasterast, wekî mînak di xewnê de diîtina maşûq û evîndarbûn an jî evîndarbûna bi bihîstina wesfên maşûqê), evîndarbûn, firaq û wusletê bèn dabeşkirin, tê diîtin ku di mînakên jorî de qonaxa “wuslet”ê pêk naye. Bi gotineke din, îsbata heqîqîbûna evîna aşiq/maşûq, cavîdanmayîna navê wan û pejiwandina serpehatiya wan wekî nimûneyên evîna heqîqî, “firaq”ê ne û tunebûna “wuslet”ê ne.

Di edebiyata kurdî de jî evîn mijareke sereke ye û xwedî tarîxeke pir kevn e. Nimûneyên cuda yên serpehatiyên evîndarî û “firaq/wuslet”a aşiq û maşûq hertim bûne mijara gelek berhemên edebî di nivîsên edîbên kurd de. Nîmuneya herî nasraw a evîna li jorê jî hat nîşandan, “Mem û Zîn” û “Xec û Siyabend” e.

Lêkolînên li ser tarîxa edebiyata kurdî nîşan didin ku rîwayetên evînê û têkiliya aşiq/maşûq di vê edebiyatê de, bi taybetî di warê qonaxên serpehatiya evînê de, bi awayên pir cuda hatine vegotin. Ev cudahî bi taybetî di rîwayetên evînî yên di destanên lehengiya kurdî de hatine vegotin, berceste dibin.

1. Nêrînek li ser Tarîxa Destanên Lehengî-Evînî di Coxrafyaya Kurdan de

Destan, bi piranî wekî helbesteke ku bi gelemperî ji kevneşopiya devkî ya kevnar, di forma vegotîneke domdar de, destkeftiyên yek an jî çend karakterên lehengî ên diîrokî an jî efsanewî, pîroz dike, tê pênasekirin û ji aliyê rexnegirên serdema Ronasansê ve wekî cureya herî payebilind a giştî ya cureyên edebî hatiye qebûl kirin. (Abrams & Harpham, 2012: 107). Di heman demê de destan, di warê kevneşopî û desthilatdariyê de, bi cihê xwe yê taybet, di lûtkeya hiyerarşiya cureyan de, bi îdfaya xwe ya herî kevnûnê û ji ber vê yekê jî ya herî desthilatdar, wekî bavê hemî cureyên edebî, tê destnîşankirin (Hardie, 2019: 26).

Kevneşopiya destanê di coxrafyaya Îranê de, di esasê xwe de, hikayeta Împaratoriyan Îranê vedibêje, ku wekî dewreke domdar a padişahan hatiye dizaynkirin. Vê keneşopiyê di çanda Îranê ya berî îslamê de dest pê kiriye û piştî îslamê jî dewam kiriye. Belgeyên tarîxî û edebî eşkere nîşan didin ku piraniya hikayetên lehengî yên çanda Îranê, bi taybetî bi destanên rojavayê Îranê, yanî herêma kurdan, berî têkçûna Împaratoriya Sasaniyan hatibûn berhev kirin (Vali, 2021: 23).

Belgeyên tarîxî, bi taybetî çavkaniyên ku ji hêla nivîskarên Yewnanî ve hatine nivîsîn derbarê tarîxa kevneşopiya destanên lehengî-evînî de, di coxrafyaya ku îro kurd lê dijîn de, yanî derbarê navenda Împaratoriya Medan de (678 b.z.-549 b.z.) agahiyên sûdmend didin û dikare bê gotin ku ev berhem, berhemên herî kevin in ku li ser vê mijarê de agahiyên didin me. Di berhemên nivîskarên Yewnanî de tê diîtin ku behsa destan, çîrok, meselok û helbestên serdema Medan hatiye kirin. Wekî mînak, Athenaeus di *Deipnosophistaeyê* de ji kesekî bi navê Dinon neqil dike ku di serdema padişahiya Astiyagê de (585-550 b.z.), padişahê dawî yê Medan, wî bi hevalên xwe re şahî li dar dixist. Di şahiya wî

de kesekî bi navê Angares destanên menzûm bi awayekî ahengî distira ku di nav stranbêjan de yê herî navdar û hozanê padişah bû (Athenaeus, 2010: 232-233).

Di heman demê de, tê dîtin ku di çavkaniyên Yewnanî de hin nimûneyên destanên lehengî-evînî yên Medan tînin dayîn. Nasîna nimûneyên destanên Medan ji bo analîzkirina destanên lehengî-evînî yên kurdan girîng in. Ji ber ku, her wekî tê dîtin, van destanan rasterast bandor li ser destanên kurdî yên serdemên îslamî kirine.

Mînaka herî kevn a destanên Medî ku hatiye tomarkirin, destana Stryangaisoyê û Zarinaiyê ye ku ji aliyê Ctesias ve hatiye neqilkirin. Ctesias (4 b.z.) di *Persicayê* de behsa rîwayeta lehengî-evînî ya Stryangaisoyê Med û Zarinaia, şebanûya Seka dike (Ctesias, 2010: 156-158).

Dîsa Athenaeus jî di berhema xwe de nimûneyeke din ji destanên lehengî-evînî yên serdema Medan dide ku wekî destana “Zariadres û Odatîs”ê tê nasîn. Li gorî rîwayetê “Du bira, Hystaspes û Zariadres li ser welatê Medan û axên jora deryaya Xezere hikim dikin. Zariadres, serlehengê destanê, di xewna xwe de Odatîsaya keça padişahê welatê Marathoiyê dibîne û aşîqî wê dibe. Odatîs jî bi heman awayî, di xewna xwe de Zariadresî dibîne û aşîqî wî dibe. Zariadres ji Homaratesê padişahê Marathoiyê keça wî dixwaze, lê padişah daxwaza wî qebûl nake, ji ber ku padişah dixwaze keça xwe bide kesekî ji welatê xwe. Ji ber vê yekê jî şahiyekê li dar dixê da ku keçik yek ji mezinên welatî wekî hevserê xwe hilbijêre. Gava ku Zariadres ji vê bûyerê agahdar dibe, bi dizî ve û bi rûyê pêçayî diçe welatê Marathoiyê û beşdarî şahiyê dibe. Padişahê welatî qerarê dide ku Odatîs qedeha kê bi şerabê tijî bike, ew dê bibe hevsera wî. Di şahiyê de Odatîs Zariadresî nas dike û qedeha wî tijî dike. Piştî aşîq û maşûq bi dizî ve li wasitaya Zariadresî siwar dibin û ji welatê Marathoiyê direvin (Athenaeus, 2010: 329-333). Li ser destana jorî heta niha gelek xebat hatine kirin (Boyce, 1955: 463-477), lê dikare bê gotin ku destana Zariadres û Odatîs berî her tiştî hem ji aliyê naverokê ve hem jî ji aliyê kesayetana ve pir dişibe destana Memê Alan (Lescot, 1942: XVII).

Belgeyên tarîxî nîşan didin ku kevneşopiya destanên lehengî li rojavayê Îranê ku îro kurd lê dijîn, piştî serdema Medan jî dewam dike. Ji van destanên lehengî-evînî yên herî nasraw yên rojavayê Îranê, yên serdema Part/Eşkanî destana “Vîs û Ramîn” û destana “Bîjen û Menîje”yê ne.

Destana “Vîs û Ramîn” yek ji destanên nasraw ên Îrana berê îslamê ye ku carinan wekî romansekê jî tê binavkirin. Ev destan li gor Sadiq Hîdayet, di wateya modern ya peyvê de, romanek e û tiştê ku “Vîs û Ramîn” jî çîrokên din ên romantîk ên kevn cuda dike, naveroka wê ye. Ji ber ku berevajî rîwayetên evînî yên kevn, mijara “Vîs û Ramîn” pir bi rehetî/gustaxî hatiye hilbijartin (Hidayet, 1377: 381).

Digel ku guhertoya pehlewî ya “Vîs û Ramîn” negehiştîye ber destê me, lêkolînên berfireh ên li ser vê destanê îsbat dikin ku ew aîdê serdema Partî ye. Li gorî Minorsky destan li ser “pehlewiyek” kevn e û gelek ji beşên wê, wan hest û

helwestan vedibêjin ku bi ramanên zewac, jin û evînê yên serdema Îslamî re naguncin (Minorsky, 1946: 741-763). Rîwayeta destanê ku ji aliyê Fexredîn Es'edê Gurganî (ss. 5a koçî) ve bi helbestkî û bi farisî hatiye honandin, wiha ye: “Di cejna biharê de (Newroz?) Şahê Merwê, Şehrûya şahbanûya bedew a Mehabadê dibîne û aşiqî wê dibe. Lê Şehrû eşqa wî qebûl nake, ji ber ku jineke zewicî ye û hem jî emirdirêj e. Lê Şahê Merwê ku mirovekî şehwetbaz e, dev ji wê bernade û dixwaze herî kêmbi keçeke wê re bizewice. Şehrû bi fikra ku êdî di vî temenî de ne mumkin e ducanî bibe, sozê dide ku eger rojekê keçikeye wê çêbibe, dê wê bide Şahê Merwê. Lê piştî demekê Şehrû ducanî dibe û keçikeye pir bedew û delal tîne dinyayê. Navê wê dikin Vîs û wê didin dadokekê da ku wê perwerde bike. Vîs li cem dadokê, ligel ‘Ramîn’ê birayê biçûk yê Şahê Merwê mezin dibe. Sal derbas dibin û Vîs digehije temenê zewacê. Şehrû dixwaze wê bide Vîroyê birayê wê. Lê Vîs nerazî ye. Dema Şahê Merwê hay ji vê bûyerê dibe, soza dayî tîne bîra Şehrûyê. Lê ne Şehrû û ne jî Vîs ji vê zewacê razî ne. Şahê Merwê arteşa xwe amade dike û êrişî wan dike. Di dema şerî de, Qarenê Şahê Mehabadê, mêrê Şehrûyê jî tê kuştin. Paşî Şahê Merwê diyariyan ji Şehrûyê re dişîne û dîsa daxwaza xwe ya zewacê vedibêje. Vê carê daxwaza wî tê qebûl kirin. Şahê Merwê birayê xwe ‘Ramîn’ dişîne da ku bûkê bîne cem wî. Ramîn ligel Vîs, tevî karwanî dikeve rê, ji Mehabadê ber bi Merwê ve diçin. Lê di rê de, ji nişka ve bayek radibe û perdeya erebeya Vîsê vedibe. Ramîn bi nihêrîna yekem, evîndarî Vîsê dibe û tê bîra wan ku ew bi hev re mezin bûne. Vîs, mecbûr bi Şahê Merwê re dizewice. Lê Vîs bi hinceta şîna bavê xwe, Şahî ji xwe dûr dixê û ji dadoka xwe dixwaze rêyeke bibîne da ku wê ji Şahî xilas bike. Dadok efsûnekê amade dike û hêza cinsî ya Şahî têk dibe. Dema ku Şah ji evîna Vîs û Ramîn haydar dibe, hêrs dibe û wan tehdîd dike. Vîs û Ramîn ji welatî direvin lê Şah wan peyda dike û vedigerîne û wan ji hev cuda dike. Ramîn di nav xema evînê de dişewite, çengekê çêdike û ji bo Vîsê stranên distire. Şah dîsa wî tehdîd dike. Bi pêşniyara rûspiyan, Ramîn ji welatî tê aforoz kirin. Ramîn terka welatî dike û bi keçeke bi navê Gul re dizewice da ku Vîsê ji bîr bike, lê bi ser nakeve û Gul jî wî berdide. Ramîn biryarê dide ku bi dagirkirina bajarî xwe bigehîne maşûqa xwe. Şeveke ku Şah çûye nêçîrê, bi çil zilamên ku cil û bergên jinan li xwe kirine, êrişê koşka Şahî dike û wî cihî talan dike. Piştî dagirkirina koşkê, Ramîn xwe ji bo şerê li hemberî Şahî amade dike lê beriya şerî, berazek êrişî Şahî dike û wî dikuje. Bi mirina Şahî, Vîs û Ramîn digehijin hev û bi salan, bi hev re dijin heta ku pîr dibin û Vîs giyanê xwe ji dest dide. Ramîn, bi xemgîniyê mezin wê dixê gorê û ew jî sê salan li kêleka gorê, di perestgeha agirî de dimîne heta ku giyanê xwe teslîm dike” (Gurganî, 1377: 41-127).

Destana lehengî-evînî ya “Bîjen û Menîje”yê jî yek ji navdartirîn destanên evînî-lehengî yên çand û edebiyata Îranê ye. Girîngiya vê çîrokê, ji bilî behsa naverok û mijara wê, ew e ku aîdê serdema Partî ye (Xakeqî Mutleq, 1369: 286) û paşî derbasî edebiyata destanî ya serdema îslamî ya Îranê bûye. Di lêkolînên edebiyata cihanê de versiyona herî nasraw a vê çîrokê riwayeta Firdewsî ye (ss. 10-11 z.) ku di berhema xwe ya navdar *Şahnameyê* de pêşkêş kiriye, lê ev destan di

nav gelek etnîsîteyên ku îro li coxrafyaya Îranê dijîn jî berbelav e. Serlehengê vê çîrokê (ku bi navên cuda, wekî “Bîjen û Gurazan (berazan)” jî tê nasîn), Bîjen e. Bîjen li gorî rîwayetên kurdî kurê Gîwê kurê Guderzê kurê Geşwad e û ji nîfşa Kawayê Hesinkar e. Dêya wî Banû Goşesb jî, keça Rustemê Zal e. Menîje jî keça bedew a Efrasiyab, padîşahê Tûranê ye. Ji ber ku di beşa sêyem a vê gotarê de, dê ev destan bi berfirehî bê ravekirin, em li vir kurteya wê nadin.

Ji xeynî hevsengî û hevşibiyên vegotin û naveroka her sê destanên lehengî-evînî yên ku li jorî hatine destnîşankirin, xala herî girîng a hevpar a van her sê rîwayetan ev e ku, di dawiya çîrokê de “firaq” bi dawî dibe û aşiq û maşûq li hev tînin û “wuslet” pêk tînin.

2. Şahnameyên Kurdî: Qada Şerî û Evîna Lehengî

Rîwayetên mîtolojîk/destanî yên ku îro wekî *Şahname* tên naskirin, di eslê xwe de mîraseke edebî ne ku ji rîwayetên Îranê yên berî Îslamê gehiştine roja me û bi zimanên cuda yên îranî yên wekî farisî, kurdî, lorî û hwd. hatine vegotin. Yek ji milletên ku rîwayetên destanî yên berî Îslamê parastine û di çanda xwe ya edebî de wekî cureyekî bi navê “Şahnameyên Kurdî” domandiye, kurd in.

Şahnameyên Kurdî, ku bi zaraveyên cuda yên kurdî hatine gotin, kuliyateke mezin e li ser gotegot û çîrokên mîtolojîk, hemasî û lehengî ku kevneşopîya neteweyî, ayînî, dînî û civakî ya kurdan vebayan dike. Ev mecmue bi piranî ji rîwayetên mîtolojîk û destanî yên pehlewani-lehengî û car caran jî evînî yên çanda kurdan pêk hatiye û ji bo nasîna ayîn û kevneşopiyên kevin ên kurdan jî çavkaniyeke gelekî girîng e. Çîrokên Şahnameyê dikarin wekî yek ji navgînên girîng bînin ku kurdan tarîxa mîtolojîk-lehengî-efsanewî yan “tarîxa zêrîn” a xwe pê veguhestiye. Yanî, çîrokên Şahnameyê hem di çanda kurdan de cihê xwe yê folklorîk girtine û hem jî bi awayekî xurt bi tarîxa kurdan re têkilhev bûne (Vali, 2021: 23-24).

Divê bê gotin ku diyarkirina tarîxa nivîsîna Şahnameyên Kurdî karekî zehmet e, lê tê bawerkirin ku ew çîrok berî Şahnameya Firdewsî ava bûne (Neqşibendî & Kazzazi & Dawudabadi 1393: 152) û vegotina wan di serdemên cuda de, di nav kurdan de dewam kiriye. Zîra çavkaniyên tarîxî behsa hebûna berhemên destanî li rojavayê Îranê, yanî li herêma kurdan, beriya serdema Firdewsî dikin. Ev sê berhem ku mixabin negehiştine roja me, “Kitêbî Seksîran” an “Sekîkîn”, “Şahnameya Pîrozana” û “Gurnameya Rustem Larcanî” ne û taybetiya van jî neqilkirina serpêhatiyên Rustemê Zal û malbata wî bûne (Akbarî Mafaxir, 1401: 9-11).

Di Şahnameyên Kurdî de kesayetê navendî, leheng e. Di riwayeta mîtîk/destanî de, leheng, kesayetekî sereke, rastîn yan xeyalî ye ku bi cesaret, hêz û zerafeta xwe, li hemberî astengî û xetereyan disekine, ji bo fedakariyê amade ye, têdikoşe, şer dike û car caran jî giyanê xwe feda dike. Di heman demê de, leheng kesekî xudan hêzeke der-mirovî (superhuman) ye, wêrekiya laşî heye, niv-xudayî, rûmetdar û parêzvan e. Lehengê destanî ji hêla pênasîyê ve “serfiraz” e.

Ew serfirazî, ji bo ku alikariya azadiyê bike, “pêwistî” yan “bextê xweş” aktîf dike. Ev jî tiştê ku azadî nikare bi cih bîne, ev bi cih tîne (Schelling, 1989: 248).

Li gorî Frye, di fiksiyona edebî de tevnê rûdanê ji karê kesekî pêk tê. Ev kes, eger “şexs” be, leheng e û fiksiyona wî/wê jî ne li gor qistasên exlaqî, belkî li gorî çalakîyên lehengî tê dabeşkirin ku ji yê xelkê mezintir, kêmtir an jî wekhev in. Frye li gorî kiryarên lehengî, cureyên lehengan dabeş dike û dibêje ku di fiksiyona edebî de em rastî pênc cure lehengan tên: 1. Lehengê mîtîk, ku ji mirovên din û derdora wan, ji aliyê cewherê xwe ve bilindtir e. Ew leheng hebûneke pîroz/xwedayî ye û çîroka wî jî wekî çîroka xwedayekî, mythos e. 2. Lehengê romantîk, ku li gorî dereceya xwe ji mirovên din û ji derdora xwe baştir e. Kiryarên wî ecêb in lê ew bi xwe wekî însanekî tê nasîn û cîhana wî wisa ye ku ji qanûnên asayî yê xwezayê dûr nasekine. Cesaret û bêhnfirehî ku ji me re xwezayî ne, ji wî re jî xwezayî ne. 3. Rêber, ku li gorî dereceya ji insanên din balatir e, lê ji hawirdora xwe ya xwezayî, ne balatir e. Hêza desthilatdarî, azwerî û îfadeya wî ji me zêdetir e lê tiştên ku dike, girêdayî rexneyên cîvakî û sistema siruştê ne. 4. Eger ne ji mirovên din û ne jî ji hawirdora xwe bilindtir be, leheng yek ji me ye. 5. Eger ji aliyê hêz û zîrekîyê ve ji me kêmtir be jî, leheng aîdê moda îronîk e (Frye, 1990: 33-34).

Lehengên Şahnameyên Kurdî ji aliyê kesayetî ve bi piranî di kategoriya lehengên mîtîk û destanî de cih digirin û bi piranî xwedî xislet in ku wekî taybetiyên lehengê mîtolojîk (Raglan, 1956: 174-175) tên qebûlkirin. Dayika wan lehengan bakîreyeke esîl e, bavê wan padîşah/mîr e, dê û bavê wan ne xizm in, bi awayekî dersirûştî dikeve malzaroka dêya xwe, car caran wekî kurê Xwedê tê pejirandin. Pîrî caran bav dixwaze zarokê xwe bikuje, li cihekî nepenî an jî li welatekî dûr, ji aliyê malbatekê ve tê xwedîkirin, behsa zaroktiya wan nayê kirin, gava dikemilîn diçin wî cihê ku dê lê bibin qral, piştî têkbirina padîşah, ejderha, dêw an jî heywanekî wehşî bi prensesa keça padîşahê berîya xwe re dizewicin, dibe padîşah/mîr, demekê bê teşqele welatî bi rê ve dibin, zagonan dinivîsin lê dûvre hezkirina xwedayan an jî gel, ji wan re namîne, ji text û bajêr tên dûrxistin, bi awayekî nepenî û bi piranî li ser girekî dimirin, ku kurên wan hebin jî nabin xwedî text/rêveberiyê, termê wan nayê veşartin lê xwedî tîrb an jî tîrbeyên pîroz in. Lêbelê tê gotin ku di navbera mînaka lehengê rojavayî û yê rojhilatî de cudahî hene. Lehengê rojavayî takekes e, ji ber vê jî bi awayekî trajîk mecbûr e bi êş û sirra demê re mijûl bibe. Lê lehengê rojhilatî cewher e. Ew di zat û eslê xwe de ne xwedî karakterekî ye lê temsîlîyeteke wî ya ebedîyetê heye. Ew lehengê destlênedayî, ji bandora têkiliyên dinyaya fanî dûr maye an jî ew bi awayekî serkeftî xwe ji wan xilas kiriye. (Campbell, 1962: 243).

Wekî tê zanîn, di zanista edebiyatê de menzûmeyên destanî û menzûmeyên lîrîk wekî du cureyên edebî yê cuda û serbixwe tên qebûlkirin. Menzûmeyên destanî bêhtir riwayetên kiryanan, ên pehlewaniyê, egîdî û mêrxasî yê leheng (an) in. Di berdêla vê de, menzûmeyên lîrîk bi piranî vebêj û rîwayetên hestên însanî yê wekî evîn, dostanî, êş, hîcran û firaqê ne. Lêbelê hin caran

menzûmeyên destanî û menzûmeyên lîrîk dikarin têkilhev bibin. Zîra serpêhatiyên lehengî dikarin bibin sebaba peydabûna evînê yan jî berevajiyê vê, evîn carinan dikare bibe sedema peydabûna destaneke lehengiyê. Di gelek berhemên edebî de em dikarin vê têkiliya destan û evînê bibinin. Yanî têgeha “evîn”ê dikare bibe hêmana sereke ya destaneke lehengiyê. Ji ber vê jî di destanên lehengî de, têgeha evînê, dikare wekî temayekê bê bikaranîn. Zîra evîn, hesteke taybet a însanan e û di xwezaya wî/wê de ye û lehengên destanan jî berî her tiştî “însan” in. Di Şahnameyên Kurdî de serpêhatiyên evînî yên lehengan ji du aliyên ve girîng in: berî her tiştî serpêhatiya evînî yan evîndarbûn dikare bibe sedema şerî, yanî serpêhatî û destanên nû. Di heman demê de jî, evîn û evîndarbûna lehengî/ê ji bo jidayikbûna lehengên nû pêwîst e.

Wekî berê jî hat gotin, di Şahnameyên Kurdî de, kesayetekî bingehîn û sereke tê dîtin: leheng. Ev kesayet di pêvajoya rîwayetên Şahnameyan de ewqas berbiçav e ku Şahnameyên Kurdî, bi gelemperî, dikarin wekî çîroka “leheng”an bînin nirxandin. Serpêhatiyên van kesayetên bingehîn jî dikarin di bin du bûyerên esasî de bînin dîtin: şer û evîn. Bi gotineke din, rîwayetên Şahnameyên Kurdî bi giştî qada şer û evîna lehengan in.

Bi analîza rîwayetên Şahnameyên Kurdî, di rîwayetên navborî de “leheng” xwedî du karakteran e ku bi tevahî jî hev cuda ne. Ya yekem kesayeta wî ye ku di dema şerî de, gava ku berjewendiyê welat-neteweyê di bin xetereyê de ye, derdikeve hole. Jixwe di rîwayetên Şahnameyên Kurdî de peywîra yekem a lehengî şerkirina li hemberî dijmin, parastina sînor û axa welatî, gel û textê padişah e. Ev dijmin carinan padişah û artêşa welatekî cîran e, carinan jî hebûneke mîtolojîk/dersirûştî wekî dêw an ejdeha û hwd. e. Leheng hertim bi cesaret û hêza xwe, li hemberî astengî û xetereyan radibe, xwe ji bo fedakariyê amade dike, şerî dike û car caran jî bo armanca xwe ya pîroz gîyanê xwe feda dike.

Karakterê duyemîn ê lehengî jî di sepêhatiyên wî yên evîndariyê de derdikevê holê. Ev karakter dikare wekî karakterê “veşartî” yê lehengî jî bê binavkirin. Gava ku mijar evîn û serpêhatiyên evînî be, bi awayekî eşkere tê dîtin ku “leheng”, bi peywendîdanîna ligel “anima”, bi wateya “laş/beden” li hemberî “animus” an “ruh” (Hillman, 1987: 18), maskeyê xwe yê “lehengî”yê radike û dide aliyekî, xwe ji kesayetiya xwe ya “lehengî”yê dûr dike, dibe mirovekî jirêzê û hetta dibe kesayetê herî bêhest. Di eslê xwe de, dikare bê gotin ku “lehengî” maskeyek e ji bo her lehengekî. Maskeyekî wisa ku “leheng”, li gorî daxwaz û hêviyên gel û civakê, mecbûr e li xwe bike. Lê gava ku leheng aşiq dibe an jî jinekê hez dike û dixwaze xwe bigehîne wê, maskeyê ku me behs kir, jî holê radibe û kesayetekî din, bi tevahî cuda ji yê ku tê nasîn, derdikeve holê. Êdî armanca “leheng”, armanceke şexsî ye û bi berjewendiyê şexsî ve girêdayî ye. Loma jî “evîn”a wî ne pîroz e, ne îdealîstîk e û bêtir realîstîk e. Ji ber vê jî pîrî caran reftar û helwesta lehengî (aşiq) li hemberî maşûqa xwe xelet, egoîst û bêhest xuya dike.

Di rîwayetên evîn û evîndariyên lehengî de, di Şahnameyên Kurdî de çend taybetmendiyan sereke tên dîtîn: di van rîwayetan de evîn tişteki hissî û dinyayî ye, yanî ne xwedî alîyekî îlahî ye. Taybetmendiya din jî ev e ku berevajî rîwayetên evînî yên klasîk ku têgeha “firaq”ê temaya sereke ye û wusleta aşiq-maşûq bi cih nabe, “evîn”ên Şahnameyên Kurdî bi piranî xwedî “dawî”yeke xweş û netrajîk in û di encamê de aşiq û maşûq, piştî firaqê, digehin wusletê.

Di heman demê de evîna lehengî di rîwayetên Şahnameyên Kurdî de, evîneke derveyî (exogamic) ye. Yanî padişah/lehengên Şahnameyên Kurdî her tim aşiqê keç/jineke biyanî dibin û ji ber vê jî lehengên herî navdar ji aliyê dayikên xwe ve, ne kurd/îranî ne. Dayikên wan hemî ne-kurd/îranî ne û bi piranî tûranî ne. Lêbelê divê bê diyar kirin ku berovajî vê yekê, qet ne mimkun e. Yanî zelamekî (leheng) biyanî tu carî nikare aşiqê keç/jinek kurd/îranî bibe. Derbarê koka kevneşopiya zewaca derveyî (exogamy) de gelek nêrînên cuda hene (bnr. Frazer, 1910: 71-169), lê cuda ji nêrîn û teoriyên hebûn û belavbûna kevneşopiya zewaca derveyî di civatên kevn de, sebaba zewaca kesayetên kurd/îranî, ku sembola ronahî/başiyê ne, digel jinên biyanî -bi piranî neteweyên dijmin yên wekî tûranî- ku sembola tarî/xirabiyê ne, dikare wekî diyalektîka ronahî/tarî, du têgehên bingehîn di cihanbîniya Îranê ya beriya îslamê de bîn nirxandin. Ronahiya mutleq û tariya mutleq hertim di şerî de ne û bi tena sere xwe de jî ne kamil in. Lê encama zewaca lehengê kurd/îranî ligel keç/jineke biyanî, di eslê xwe de, tê wateya tevlihevbûna van du hêzên dijber ku encama vê bûyerê jî jidayikbûna lehengekî “kamil”, xwedî hêz û sifetên der-mîrovî ye. Ji ber vê jî ew dibin serlehengên rîwayetên kurdî/îranî. Çimkî ew, cihê xuyabûna dervatirîn nirxên civatê ne û di laşên xwe de hêzên herî ronî û yên herî tarî bi hev re dihewînin.

Wekî berê jî hat gotin, rîwayetên evîndariyê xwedî çend qonax û merheleyan in. Yekem qonax, qonaxa naskirinê ye ku aşiq-maşûq hevdu nas dikin. Ev qonax di rîwayetên cuda de dikare bi awayên cuda pêk bê. Di vegêrana edebiyata cîhanê de tê dîtîn ku aşiq bi dîtina rasterast an ne rasterast (di xewna xwe de), an bi dîtina sûretê maşûqê, an jî tenê bi bihistina wesfên wê/wî, dikare evîndar be. Piştî qonaxa aşiqbûnê, bi piranî qonaxa firaq û hîcranê dest pê dike. Di rîwayetên evînî yên klasîk de, wekî hat diyarkirin, ev qonax heta dawiya rîwayetê dewam dike û “wuslet” tu carî pêk nayê. Aşiq û maşûq her di êş û derdê firaqê de dimînin, bi arezûya wusletê dişewitin û di dawiyê de jî giyanê xwe ji bo eşqa xwe teslîm dikin. Wekî hat gotin Leyla û Mecnûn, Romeo û Juliet, Şîrîn û Ferhad û Mem û Zîn nimûneyên herî navdar ên vê evîna îdealîzekerî ne.

Di rîwayetên Şahnameyên Kurdî de jî destpêka serpêhatiyên evînî yên lehengî wekî nimûneyên li jorê diqewimin. Aşiq (keç/jin be an zelam) bi dîtina rasterast an ne rasterast, an jî tenê bi bihistina wesfên wê/wî, evîndar dibe. Piştî vê qonaxa yekem, cudahiya di navbera serpêhatiyên evînî yên di Şahnameyên Kurdî de û serpêhatiyên evînî yên “klasîk” derdikevin holê.

Di vegêrana Şahnameyên Kurdî de piştî ku leheng evîndar dibe, yan yekser bi maşûqa xwe re digehine hev, yan aşiq û maşûq demeke kurt ji hev dûr dibin, lê

di dawiyê de dîsa digehin hev. Yanî digel hebûna merheleya “firaq”ê, encama serpêhatiya evînî, “wuslet” e.

Xaleke din a girîng jî ew e ku di rîwayetên evînî yên navborî de ne pêkan e ku leheng (aşiq) dema cudabûn/cudamayîna ji maşûqa xwe, behsa derd û êşa “firaq”ê bike. Yanî digel ku evîn çînên civakî û cudahiyên nijadî ji holê rake jî, di rîwayetên Şahnameyê de tu carî leheng li ber jineke (maşûq) biyanî xwe şermezar û biçûk nake (Battesti, 1400: 34). Di hin rîwayetên evînî yên Şahnameyên Kurdî de, wekî em ê bibînin, dibe ku piştî wusletê, firaq di navbera aşiq û maşûqê de çêbibe. Lê dîsa jî aşiq (leheng) qet gazinan ji derd û êşa evîn û firaqê nake.

Serpêhatiyên herî navdar ên evînî yên ku di Şahnameyên Kurdî de hatine vegotin evîna “Zal û Rûdabe”, “Rustem û Tehmîne”, “Rustem û Keça Mesîhayê Abid”, “Bîjen û Menîje”, “Berzû û Hûrîliqa” û “Berzû û Mihrê Cihansoz (Sîmîn Uzar)” in.

3. Nimûneyên Wuslet û Firaqa Leheng di Şahnameyên Kurdî de

3.1 Zal û Rûdabe

Yek ji serpêhatiyên evînî yên navdar ên rîwayetên Şahnameyên Kurdî, evîna Zal û Rûdabeyê ye. Li gorî mîtolojî û destanên îranî, Zal kurê Sam û bavê Rustem e. Navê wî wekî “Zalê Zer” derbas dibe ku peywa “zal” û “zer” her du di wataya “kal” de ne (Sefa, 1363: 561).

Li gorî rîwayetên destanî kurê Sam nebû û dilê wî zarokek dixwest. Jineke wî ya xweşik hebû û jê hêvî dikir ku kurekî bide wî. Ev jin bi hemle bû û piştî neh mehan kurekî xweşik anî dinyayê lê porê wî zarokî gişt spî bû. Dêya wî zarokekî wisa anîbû dinyayê ku newêrabû ji Sam re behsa wî bike. Heft rojan kesekî newêrabû ji Sam re bibêje ku jina wî zarokekî kal aniye dinyayê. Dawiya dawî, dêşîra wî bi wêrekî diçe cem Sam û jê re dibêje ku Xwedê tiştê ku xwestiye dayê. Sam ji textê xwe dadikeve û ji bo dîtina zarokê xwe diçe cem. Zarokekî pir xweşik dibîne li hemberî xwe ku ew xweşikbûn di kêma însanan de heye, lê serekî wekî yê kalan ku tu caran nedîtiye. Wexta ku kurê xwe dibîne hemî hêviyên xwe yên cîhanê wenda dike. Ji kurê xwe şerm dike û diqehire, neletê li qedera wî dike û fermanê dide ku wî zarokî bibin derveyî welêt (Vali, 2021: 63).

Zarok li derekî nêzîkî çiyayê Elborzê, tê terkkirin. Hêlîna Sîmurx, teyrê efsanewî, jî li ser wî çiyayî bûye. Gava ku çêlikên Sîmurx birçî dibin, çûka hêzdar ji bo peydakirina xwarinekê difire û Zalê sava dibîne ku ew ji birçiyaran digirî. Sîmurx dadikeve, wî digire û tîne hêlîna xwe û dibe xwediyê Zal û wî perwerde dike. Zal demeke dirêj li hêlîna Sîmurx dimîne. Sîmurx Zalî xwedî dike, navê Destanê Zend lê dike (Vali & Ölmez, 2022: 315). Li gorî rîwayetên Şahnameyê Sam di xewna xwe de kurê xwe dibîne. Piştî jixewrabûnê gazî yên mezin û zana dike û behsa xewna xwe dike. Yê zana jê re dibêjin ku bila biçê û li kurê xwe bigere. Sam biryarê dide û derdikeve rê, ber bi çiyayan ve diçe da ku kurê xwe bibîne. Sîmurx derdikeve

ser çiyayî, Sam û alfgirên wî dibîne. Dizane ku Sam ji bo kurê xwe hatiye. Zarokî amade dike ji bo çûyîna wî. Sîmurx, Zalî teslîmî Sam dike û yek ji perên xwe dide wî, da ku di bin siya hêza wî de bimîne (Vali, 2021: 67). Zal ji çiyayî dadikeve û diçe cem bavê xwe û dibe lehengekî navdar û Sam jî textê xwe teslîmî Zal dike û rêberiya artêşa xwe dide wî. Zal dibe pehlewane Menûçêhrê Padişahê Îranê. Zal hertim rojên xwe bi nêçîr û şahiyê derbas dike:

Ev saete dewran mestanê mey bî
 Şay Menûçêhr padişay Key bî
 Rojî ne rojanê Menûçêhr Key
 Saqî ne dewran bade çenî mey
 Zal pehlewane bî ve paytextê şa
 Ve fermaniş bî temami şipa
 Hey binwaz binwaz badey erxewan
 Serxweş bîn ve mey Şa pehlewane
 Her roj ve şikar şevan bi şadî
 Seday kûs meçiya wadî ve wadî
 Bêhtir ve şahan Keyanane Key
 Meçiya ve gerdûn naley def û ney
 Her ye kariş bî Menûçêhr ve text
 Îmcar bişnewîm ve şahanê wext (Hemzeyî, 1393: 909- 910).

Jiyana Zal bi nêçîr û şahiyê derbas dibe heya ku ew wesfa bedewiya keça Mihrabê padişahê Kabulê dibihîze. Li gorî riwayetan, Mihrab ji malbata Zehak bû û hemî welatê Kabulê yê wî bû. Her sal xerac û bac dida Sam, lewre nikarîbû li hemberî wî şerî bike. Li gorî Şahnameyên Kurdî Mihrab xwedî keçekê bû bi navê Rûdabe, bi husn û cemal û kemalê di dinyayê de navdar bû. Gava ku Zal terîfa bedewiya Rûdabeyê dibihîze, bêyî ku wê bibîne evîndarê wê dibe. Lê ji ber ku Mihrabê bavê Rûdabeyê, neviyê Zehak e (Shahbazi, 2002) Menûçêhr û Sam naxwazin ku Zal bi Rûdabeyê re bizewice:

Mihrab ve bane textê wêş berqerar bî
 Padişay Babul ney roj ve kar bî
 Yek duxterî daşt wêney hûr perî
 Zuleyxay Yemen Belqîs şay perî
 Meşhûr bî ve nam ew husn û kemal
 Ta kêk kêk yava te'rfîş ve Zal
 Her ve nedîde mihrîş nîşt ve dil

Munadî ve zewq Zal nemana batil (Hemzeyî, 1393: 910).

Lê di dawiyê de Zal dikare wan razî bike ku bi Rûdabeyê re bizewice û wuslet di nav wan de pêk tê:

Ve sed felaket Zal bî qerîn

Resî ve wisal ev hûrî cemîn (Hemzeyî, 1393: 910).

Wekî tê dîtin, qonaxên evîna Zal û Rûdabeyê wekî “Bihîstina wesfa maşûq, aşiqbûn, firaq û wusletê dikare bê rêzkirin. Lê xala balkêş ev e ku berî her tiştî, di pêvajoya rîwayetê de tenê di niv-beytekê de behsa derdê firaqa Zal, derbas dibe. Aşiq jî qet gazinan ji derd, êş û zehmetiya firaqê nake. Di heman demê de dema firaqa aşiq (Zal) ji maşûqa xwe pir kurt e û piştî vê dema kurt a firaqê, wusleta aşiq û maşûq pêk tê.

Divê bê gotin ku çîroka evîna Zal û Rûdabeyê herçiqas kurt be jî di destanên lehengî-evînî yên cîhana Îranê de xwedî cihekî taybet e. Zîra bi saya vê evînê lehengê sereke yê destanên kurdo-îranî yanî Rustemê Zal ji dayik dibe. Li gorî rîwayeta Şahnameyên Kurdî, piştî zewaca Zal û Rûdabeyê, neh meh û neh roj derbas dibin û Rûdabe kurekî tîne dinyayê ku navê wî dikin Zeware (Hemzeyî, 1393: 910). Heft sal şûnde Rûdabe careke din bardar dibe. Lê barê wê giran û zikê wê pir mezin e. Bijîşkên navdar nikarin dermanê derdê wê bibînin. Di dawiyê de bi alîkarî û rênîşandana Sîmurx, Rustem tê dinyayê. (Hemzeyî, 1393: 911-912).

3.2. Rustem û Tehmîne

Wekî hat gotin, Rustem bêguman lehengê sereke ye di hemî rîwayetên mîtolojîk û destanî yên rîwayetên edebiyata kurdî û îranî de. Kesayeta wî bi piranî bi şerên li hemberê dêw, ejdeha û padişahên wek Efrasiyabê tûranî tê zanîn. Rustem wekî lehengekî, xwedî hêzên derasayî ye. Hertim parêzvanê sînoren welat û textê padişah e. Tacbexş û rizgarker e û amade ye da ku giyanê xwe ji bo nirxên neteweyî feda bike. Lê ji bilî van mijarên navborî, serpêhatiyên evînê yên Rustem jî hene. Dikare bê gotin ku serpêhatiyên lehengiya Rustem ewqas girîng in ku macerayên wî yên evînî bi piranî tîne piştguhkirin. Li gorî rîwayetên Şahnameyên Kurdî, Rustem xwedî sê kurên bi navê Suhrab, Feramerz û Cihangîr; û sê keçên bi navê Guşesb Banû, Zer Banû û Gîsiya Banû ye. Lê di rîwayetên Şahnameyên Kurdî de bi tenê serpêhatiya evîniya wî ya bi dêya Suhrab û Cihangîr re û di hin rîwayetan de ya Feramerz hatiye vegotin.

Serpêhatiya evîna Rustem û Tehmîneyê, keça padişahê Semenganê, di destana trajîk a ku bi piranî wekî “Rustem û Suhrab” navdar e, hatiye vegotin. Destan bi çûyîna Rustem a ji bo nêçîrê dest pê dike. Rustem diçe nêzîkî sînorê Tûranê ji bo nêçîrê. Wexta ku nêzî bajarê Semenganê dibe, derekî tijî bi kerkûviyan dibîne. Hespê xwe tevdigerîne û dest bi nêçîrê dike, çend kerên kûvî dikuje. Yekî ji wan dipêje û dixwe. Dûv re xwe dirêj dike û dixwaze hinek bêhna xwe bide dema ku hespê wî Rexş diçêre. Çend siwariyên tirk tîne, Rexşî dibînin. Dixwazin wî bigirin û çend toran diavêjin hemberî wî. Hesp xwe diparêze, lê wî

digirin û dibin bajêr. Dema ku Rustem şiyar dibe, li hespê xwe digere lêbelê li tu derê nabîne. Bi hêrs, dikeve rêya Semenganê. Dema ku nêzîkî bajêr dibe, padişah û yên mezin hîn dibin ku Rustem bi peyatî hatiye bajarê wan. Hemî dixwazin wî bibînin. Padişah bi peyatî tê cem wî. Rustem ji wan re dibêje şopa lingên hespê wî heta Semenganê tê. Rustem hespê xwe terfî dike. Heke wî peyda bikin Rustem dê gelek minetdar be. Lê heke Rexş neyê peydakirin, dê serê mezinan jê bike. Şahê Semenganê dixwaze Rustem aram bike, jê re dibêje Rexşê Rustem nikare bê veşartin, ji ber ku herkes wî nas dike. Sozê didine wî ku ew ê lê bigerin û dê bi lez wî bînin. Ev gotin kêfa Rustem tîne, çûyîna cem padişah qebûl dike û yên mezin pêşwaziya wî dikin bi ziyafetekê. Rustem westiya ye, ji ziyafetê radibe û diçe radikeve (Behramî, 1389: 54-57).

Wê şevê, Tehmîneya keça şahê Semenganê diçe odaya Rustem. Tehmîne yekane jin e ku di Şahnameyên Kurdî de navê wê wekî jina Rustem hatiye tomarkirin û wekî piraniya çîrokên Şahnameyê, Rustem rastî vê jinê tê ku ne ji koka wî ye û ne jî ji welatê wî ye (Vali, 1369: 176). Rustem şiyar dibe û rûyê Tahmîneyê dibîne. Rustem navê wê dipirse û dixwaze hîn bibe ka li çi digere di tariya şevê de.

Tehmîne xwe dide nasîn û jê re dibêje ku yekane keça şahê Samanganê ye (Behramî, 1389: 57-58). Tehmîne jê re dibêje ku wexta egîdiya Rustem seh kiriye, evîndarê wî bûye û ji bo ku Rustem were Semenganê, planek çêkiriye. Ferman daye siwaryên xwe ku hespê Rustem bidizin û wê bi vî awayî Rustem anîye bajarê xwe (Lutfiniya, 1399: 112) û niha jî ji bo eşkerekirina evîna xwe hatiye cem wî. Tehmîne daxwaza xwe tîne ziman: wuslet û anîna kurekî ji Rustem:

Jewsa ve sewday tom keft ne xeyal

Ve xem wiyerdim roj û mang û sal

Ji dewrê qedîm her ta ve îsa

Coftê min perî tu nemebû peya

Er kurik je min ji piştê te bû

Seranser ‘alem ve hem mekûbû (Behramî, 1389: 58).

Di nav jinên ku di rîwayetên Şahnameyê de hatine behskirin, Tehmîne wekî jineke bîaqil tê dîtin (Basirizadeh & Raoufzadeh & Zaheri, 2020: 772) ji ber vê jî jê re soza peydakirina Rexş jî dide. Piştê Tehmîne radibe û diçe odeya xwe. Rustem jî ji bedewiya Tehmîneyê matmayî dimîne û evîndarê wê dibe:

Pîlten heyran daney laleş bî

Aşuftay cemîn zulf û xaleş bî (Hemzeyî, 1393: 342).

Li gorî hin nêrînan, Rustem teswîra “anîma”ya xwe di Tehmîneyê de dibîne (Alimoradi & Eşrefzade, 1398:216). Di heman demê de xwesteka Tehmîneyê (daxwaza kurekî ji Rustem) dikare wekî xwestekeke xweperest (egoist) jî bê nirxandin (Abdullaeva, 2012: 41). Roja din, Rustem gazî padişahê

Semenganê dike û ji padişahî keça wî dixwaze. Padişahê Semenganê bi vê daxwazê pir kêfxweş dibe û keça xwe dide Rustem. Daweteke mezin tê kirin û Rustem û Tehmîne şevekê bi hev re derbas dikin û wusleta wan pêk tê:

Ev şev ke cem biyan be şadimanî

Kamrewa bibîn dil be tamamî (Lutfiniya, 1399: 113).

Ev şev ta ve su razan mekirdin

Ne camê hem şerbet wesil mewirdin (Behramî, 1389: 58).

Murad hasil bîn her du çenî hem

Şad biyan we hem Tehmîne û Rustem (Hemzeyî, 1393: 342).

Roja din, piştî peydabûna hespê wî, Rustem Tehmîneyê dihêle û vedigere welatê xwe. Beriya ku jê veqete, Rustem mucewherekî, ku li ser milê xwe girê dabû, dide Tehmîneyê û jê re dibêje: heke tu keçekê bînî dinyayê, vê daynê ser porê wê, lê heke kur be, bi milê wî ve girê bide. Ji neh mehan şûnde Tehmîne kurekî tîne dinyayê ku dişibe Rustem. Navê wî dikin Suhrab. Di dewama vê destana trajîk de Suhrab mezin dibe û gava ku hîn dibe ka bavê wî kî ye, artêşekê amade dike û diçe şerî da ku bavê xwe bike şah. Lê bi lîstika qedere bav û kur, bêyî ku hev nas bikin, di qada şerî de rû bi rû dimînin, şerî dikin û Rustem kurê xwe dikuje. Li gorî hin guhertoyên destanê dema Tehmîne xebera mirina kurê xwe dibihîze, artêşekê amade dike û êrîşî Rustem dike da ku wî bikuje û tola kurê xwe veke. Lê Zal dibe navbeynkar, Rustem û Tehmîne aştiyê pêk tînin û bi vî awayî Feramerz ji dayik dibe (Lutfiniya, 1399: 155; Hemzeyî, 1393: 387).

Di serpehatiya evîna Rustem û Tehmîneyê de çend xalên girîng tên dîtin. Berî her tiştî aşiq, Tehmîne ye ku bi bihîstina wesfa lehengî û egîdiya Rustem, evîndarê wî bûye. Îcar Rustem di pozisyona “maşûq” de ye. Ew piştî dîtina bedewiya Tehmîneyê, evîndarê wê dibe. Meseleya duyemîn a girîng jî ew e ku qonaxa “wuslet”ê pir hêsan, bêyî êş û derdê firaq û hîcrana aşiq û maşûqê pêk tê. Mijareke din a ku balkêş jî ew e ku “wuslet” a wan tenê şevekê berdewam dike û roja din, Rustem terka Tehmîneyê dike. Li vir dikare bê gotin ku “firaq” a rasteqîn di navbera Rustem û Tehmîne de ji vir dest pê dike. Lêbelê di berdewamiya destanê de, heta dawiya rîwayetê, qet behsa derd, êş an zehmetiya firaqê nayê kirin. Rustem di vegotina destanê de qet behsa Tehmîneyê an jî qet gazinan ji derd û êşa firaqa wê nake. Tehmîne jî carekê tenê, gava ku aşiqê Rustem bûye gazinan ji firaqê dike û dibêje ku hertim di hêviya dîtina Rustem de bûye:

Îne çen sal in min arezûm in

Ne fikir û xeyal dîdinî tum in (Lutfiniya, 1399: 112).

Piştî wuslet û çûyîna Rustem jî tenê carekê behsa girîn û hawara Tehmîne ji bo Rustem, hatiye kirin:

Daîm pêy Rustem menala we derd

We emrê Xuda bar hemliş kird (Hemzeyî, 1393: 344).

Daîm pêy Rustem menala ce derd

Gerdanay Gerdûn barê hemliş kird (Lutfiniya, 1399: 114).

3.3. Rustem û Keça Mesîhayê Abid

Rîwayeta evîna Rustem û Keça Mesîhayê Abid ku di destana Cîhangîrnameyê de hatiye vegotin, yek ji serpêhatiyên evîndariya Rustemê Zal e ku di Şahnameyên Kurdî de tomar bûye. Li gorî destanê ku heta niha versiyona kurmançî û goraniya wê hatiye dîtin, rojekê bûyera Suhrab û mirina wî tê bîra Rustem. Ji ber vê xemgîniyê siwarê hespê xwe dibe û diçe ser gora Suhrab. Ji hespê xwe peya dibe, li ser gora kurê xwe digire û demekê li wir dimîne. Piştî siwarê hespê xwe dibe û diçe. Di versiyona goranî de Rustem digehije ser kaniyekê. Li ber kaniyê keçeke bedew dibîne û evîndarê wê dibe. Ji xelkê dipirse ka ev keç kî ye? Dibêjin keça Mesîhayê Abid e:

Yawa ve gîlan ve yek çeşmey av

Diya duxterê çûn şemey aftav

Aşiq bî ve bedr nûrî cemaliş

Şeyda ve lêve bî pirsê hevaliş (Lutfiniya, 1400: 175).

Li gorî versiyona kurmançî ya destanê jî Rustem Îranê terk dike û diçe Mazenderanê. Li wir keça Zahid, şahê Mazenderanê dibîne û dilê wî dikeve keçikê û aşiq dibe:

Padişahê zahid kiçekî hebû

Xuştiqî û nazenîn mehbûbe ew bû

Ew kiçe rojekê hate layê Rostem

Bi qudreta Xudayê xalqê alem

Rostem aşiqî ew kiçe bûbû

Li gel wê kiribû çend giftugo (Oremanî, 2002: 115).

Divê bê gotin ku ne di versiyona goranî de ne jî di versiyona kurmançî de navê vê keçe nehatiye diyarkirin. Di her du versiyonan de jî wekî “keça padişah” û piştî ku kurê xwe (Cîhangîr) tîne dinyayê kî wekî “dêya Cîhangîr” hatiye behskirin.

Li gorî rîwayeta destanê Rustem bangî padişahî dike û ji padişahî keça wî dixwaze. Padişah jî ji daxwaza Rustem pir kêfxweş dibe lê ewilî ji keça xwe dipirse. Keçik jî ji bavê xwe re bersiva erênî diyar dike. Padişah ji bo Rustem û keça xwe daweteke mezin çêdike û keça xwe dide Rustem. Rustem û keça padişahî çil roj û çil şevan di heremê de derbas dikin:

Abid rizaş bî duxter kird nîkah

Her îd perî wêş zana ray selah

Heta ke çil roj ce xelwetxane

Bî ne şewq û zewq eyes merdane (Lutfiniya, 1400: 175).

Wekî roj li xerbî ava bû tamam

Çerde berdbûn yêt taze xiram

Rustem wê şevê bi meqsûd şad bû

Xwe digel nazenîn ta fecr şad bû (Oremarî, 2002: 117).

Berdewamiya vê destanê wekî destana “Rustem û Suhrab” e. Li gorî versiyona goranî ya destanê, roja din Rustem keça padişahî dihêle û terka welatê padişahê Mazenderanê dike. Beriya ku jê veqete, Rustem dîsa mucewherekê dide keça padişahî û jê re dibêje: “Ez dizanim ku tu ducanî yî, heke tu keçekê bînî dinyayê, vê dayne ser porê wê, lê heke kur be, bi milê wî ve girê bide” (Lutfiniya, 1400: 175). Bi vê gotinê dikeve pey serpêhatiyên xwe yên lehengî. Di versiyona kurmancî ya destanê de behsa mucewherî nayê kirin û rojekê Rustem diçe nêçîrê û bi vî awayî jina xwe terk dike, diçe dû serpêhatiyên xwe û êdi Rustem û keça padişahî hevdu nabînin.

Digel ku destana Cîhangîrname dewam dike jî, êdî qet behsa “keça padişahî” û evîndariya Rustemê Zal nayê kirin.

Di serpêhatiya evîna Rustem û keça Mesîhayê Abid de jî çend xalên bingehîn tên dîtin. Berî her tiştî navê “maşûq” tu carî derbas nabe. Kesayeta wê bi kesayeta bav û kurê wê tê diyarkirin. Rustem bi dîtina wê, aşiq dibe, lê wusleta wan, dîsa pir hêsan, bêyî derbaskirina “firaq”ê, pêk tê. Piştî “wuslet”ê, “firaq” di nav wan de dest pê dike, lêbelê di berdewamiya destanê de, heta dawiya rîwayetê, qet behsa derd, êş an zehmetiya firaqê nayê kirin. Rustem di vegotina destanê de qet behsa maşûqa xwe, an gazinan ji derd û êşa firaqa wê nake û ev keç/maşûq bêyî hîç şopekê ji sehneya Şahnameyên Kurdî wenda dibe.

3.4. Bîjen û Menîje:

Wekî hat gotin destana lehengî-evînî ya Bîjen û Menîjeyê destaneke kevn e ku ji serdema Partî wekî mîrateke edebî gehiştîye roja me. Ev destan ku wekî “Bîjen û Gurazan” jî tê nasîn, hem di edebiyata farisî û hem jî di edebiyata kurdî de xwedî çendîn versiyonan e û tê gotin ku yekem çîroka Şahnameya Firdewsî jî, çîroka kevn a “Bîjen û Menîje” bûye (Sefa, 1363: 177). Bîjen û Menîje weke destaneke kamil ku ne lazim e tiştêkî lê bê zêdekirin, ne jî kêr kirin (D’Avril, 1888: 70) tê qebûl kirin.

Bîjen (aşiq), serlehengê destanê, li gorî hin pisporên wek Roland, lehengê destanî yê rojavayî ye, di çanda îranî de. Û car caran jî destana Bîjen ligel destana Parzival jî tê berawirdkirin (Coyajee, 1371: 124) û dikare bê gotin ku kesayeta Menîjeyê jî, kesayeteke taybet e di nav maşûqên lehengên Şahnameyên Kurdî de, ji ber vê jî li gorî hin lêkolîneran Menîje bi sade/safbûn û xwezayîbûna xwe, bi

aramî û nefsbîçûkiyê, bi tevahî xwe dide ber nezera aşiqê xwe wekî “jina îdeal” a serdema destanî hatiye qebûlkin (D’Avril, 1888: 71).

Di çîroka Bîjen û Menîjeyê de bihevketina di navbera du evîndaran de ya ji ber nakokiyên evîndarî û netewetiyê, mijareke girîng e di destanên Şahnameyê de. Ji ber wê jî em dikarin wan destanan wekî destanên dramatîkî bihesibînin (Xaleqî Mutleq, 1381: 91).

Li gorî rîwayetên Şahnameyên Kurdî serpêhatiya evîna Bîjen û Menîjeyê di serdema padişahiya Key Xusrew de diqewime. Wekî hat gotin, Bîjen kurê Gîw e û ji aliyê dêya xwe Banûguşesbê ve jî neviyê Rustemê Zal e.

Çîroka evîna Bîjen û Menîjeyê di Şahnameyên Kurdî de bi hatina komeke însanan dest pê dike ku ji welatê Ermanê tînin ji bo dîtina Key Xusrew. Ev welat, li gorî erdnîgariya xeyalî ya Fîrdewsî, di navbera Îran û Tûranê de ye. Ew tînin cem Key Xusrew û jê alîkariyê dixwazin da berazan bikuje, ji ber ku beraz welatê wan tarûmar dikin. Padişah ji mezinên artêşa xwe re dibêje ka kes dixwaze tevî wan biçe daristanê û berazan bikuje. Ji xeynî Bîjen, kesek bersiva padişahî nade. Bîjen vê peywirê hildigire ser xwe û bi Gurgîn re derdikeve rê, yê ku rêberiya wî dike ber bi welatê Ermanê ve. Dema ku digehijin daristanê, berazan dibîne û amadehiya nêçîrê dike. Roja din, Bîjen ji hevrêyê xwe Gurgîn re dibêje em bi hev re biçin nêçîra berazan. Lêbelê Gurgîn red dike, ji ber ku Bîjenî xwest wî karî bike û divê ew bike. Bîjenê ku bi bersiva Gurgîn şaş dimîne, dide pey şopa berazan û xwe ji bo şerî amade dike û hemiyan dakuje. Gurgîn ji serkeftina Bîjen diheside û fenekê lê dike. Ji Bîjen re behsa bedewiya Menîjeyê, keça Efrasiyab û baxçeyê wê dike ku kêma der hene bi wê xweşiyê û jê re dibêje bila biçe wî baxçeyî da ku bibe yekî bi navûdeng.

Cew teref ce milkê şay Efrasiyab

Hisarî kêşan ve baxçey bû gulab

Seaviş ce terhê bihişt memanû

Ne deriş durrac û qumrî mewanû

Her sal kenaçey şay Efrasiyab

Meşû ve seyran baxçey bû gulab

Zulfan emberîn Menîje namiş in

Çend hezar şahan giriftariş in (Mokri, 1966: 5).

Bîjen vê pêşniyazê qebûl dike û diçe baxçeyê Menîjeyê. Lê ji ber ku westiyaye, li bin darekê radizê. Yek ji xizmetkarên Menîjeyê wî li bin darê dibîne û ji Menîjeyê re behsa rûyê bedew ê Bîjen dike. Dilê Menîjeyê bi tiştên ku dibihîze germ dibe. Radibe û diçe ba Bîjen û dema ku wî dibîne, evîndarî wî dibe. Bi nermî, destê xwe dide rûyê Bîjen û wî şiyar dike. Nav û nîşana wî dipirse û gazî wî dike ku bê meclîsa wê (Mokri, 1966: 6-8). Lê li gorî versiyoneke din a çîroka Bîjen û Menîjeyê, gava ku Bîjen diçe baxçeyê Menîjeyê, ji dûr ve lê dinêre. Dema porê

Menîjeyê, yê wekî Şehmaran û rûyê wê yê wekî Camê Cemê dibirîqe dibîne, evîndarê wê dibe:

Westin ce balay dîbay bû gulab
Niştin Menîjey şay Efrasiyab
Zulfan çûn şamar çem werdin ve hem
Cemîn wêney Camê Cihannumay Cem
Bîjen çunke dî zamiş xeter bî
Aşiq be zulfan çetrê qemer bî (Lutfîniya, 1399: 102).

Menîje jî bi dîtin û nasîna Bîjen, evîndarî wî dibe dilê wê bi evîna Bîjen dişewite:

Belê Menîjey şay Efrasiyab
Nihanî ce eyş diliş bî kebab (Lutfîniya, 1399: 105).
Belê Menîjey şay Efrasiyab
Nihanî ce eşqê ev bî dil kebab (Mokri, 1966: 8).

Bîjen û Menîje çend rojan bi hev re derbas dikin. Lê paşê Bîjen dixwaze here welatê xwe. Lêbelê Menîje, ku hem xwedî xisleta bedewbûn û hem jî lehengî ye (Vaccha, 1950: 169) nikare dev ji Bîjenî berde:

Watiş kenîzan bala zer sitûn
Derûnim ce eşq ser pîrr in ce hûn
Ev ro ke balay Bîjen dîm ve çem
Sûçiyam wêney perwane lay şem (Mokri, 1966: 9).

Ji ber vê jî dermanê hişbir dide Bîjen û wî dixwe nav sindoqekê û Bîjenê razayî dibe welatê xwe. Bi dizî wî dibe qesra xwe û dema ku Bîjen şiyar dibe, xwe li qesra Menîjeyê, li paytextê Efrasiyab, dibîne. Bîjen li wir dimîne heta ku xulamek bi wî dihese û ji Efrasiyab re dibêje. Efrasiyab pir hêrs dibe, birayê xwe dişîne da ku Bîjen bi zincîrê girê bide û biavêje nav çalekê. Efrasiyab fermanê dide ku qesra keça wî hilweşînin da ku wê ji mal û milkên wê mehrûm bike. Menîjeya bêçare, li cem çalê dimîne. Bi rojan parsekiya nanî dike û bi şevan jî diçe cem çalê û nanê ku berhev kiriye, ji qula ku vekiriye, digehîne Bîjen û ew jî li cem çalê ji derdê firaqê gazinan dike (Behramî, 1383: 309-310).

Piştî demekê, Rustem bi cilên bazirganan, bi karwanekî dikeve rêya Tûranê ji bo azadkirina Bîjen. Dema ku Menîje xebera li ser karwanî seh dike, berê xwe dide Rustem û alîkariya wî dixwaze ji bo Bîjen. Rustem xwe eşkere nake da ku ewle bibe. Wê demê, Rustem xwarinê amade dike, gustîlka xwe tê de vedişêre û dide Menîjeyê da ku ji Bîjen re bibe. Dema ku Bîjen gustîlkê bibîne ew ê fam bike Rustem li wir e. Menîje wê xwarinê dibe û dide wî û Bîjen gustîlka Rustem tê de peyda dike. Bîjen ji Menîjeyê re dibêje bila careke din biçê cem karwanî û bi vî awayî Rustem xwe pê dide nasîn. Bi daxwaza Rustem, Menîje li

nêzîkî çala Bîjen êzingan kom dike. Dema ku dibe şev, Menîje agirekî vêdixê û rêberiya Rustem dike ji bo dîtina çalê. Rustem Bîjenî azad dike û piştî tevî lehengên din, berê xwe dide qesra Efrasiyab da ku cezayê wî bide. Şerekî mezin diqewime û Efrasiyab direve. Piştî şerî jî Menîje û Bîjen, bi Rustem û lehengên din re diçin Îranê. Key Xusrew pêşwaziya wan dike, fermanê dide ku bila şahiyekê amade bikin û Bîjen û Menîje digehijin hev” (Mokri, 1966: 39).

Wekî tê dîtîn, di destana Bîjen û Menîjeyê de jî piştî hev dîtîn û aşiqbûnê, digel ku di nav aşiq û maşûqê de firaqek diqewime, di dawiya destanê de, dîsa aşiq û maşûq digehijin hev û wusleta wan pêk tê.

3.5. Berzû û Maşûqên Wî

Yek ji serpêhatiyên evînî yên Şahnameyên Kurdî jî evîna Berzûyê kurê Suhrabê kurê Rustemê Zal û maşûqên wî ye. Divê bê gotin ku serpêhatiyên evînî yên Berzû, yek ji nimûneyên herî balkêş e di destanên lehengî-evînî yên Şahnameyên Kurdî de.

Li gorî rîwayeta destanê di şerê Îran û Tûranê de Rustem artêşa Tûranê têk dibe û Berzû jî esîr dike. Lê paşî eşkere dibe ku Berzû di eslê xwe de kurê Suhrab e, yanî neviyê Rustem e. Hemî welat ji vê xeberê kêfxweş dibe. Dema Rustem egîdî û lehengiya Berzû dibîne, dixwaze meqamê femandariya artêşa Îranê bide wî. Feramerzê kurê Rustem li dijî vê biryarê derdikeve. Ji ber ku xwe layiqî femandariya artêşê dibîne. Dema Rustem dibîne ku di navbera kurê xwe û neviyê xwe de maye, ji bo bidestxistina wî meqamî şertekî tayîn dike: Girtina Fuladwendê Dêw ku li sînore welatê Çînê ye. Gava mêrxas navê wî dibihîzin, hemî paşde diçin. Tenê lehengek dimîne: Berzû.

Berzû xwe amade dike û ji bo erka xwe bi cih bîne dikeve rê. Di pevajo ya serpêhatiyên xwe de Berzû digihije baxçeyekî ecêb û ji baxçevanî dipirse xwediyê vî baxçeyî kî ye û baxçevan jê re dibêje ku ev baxçeyê Hûrîliqayê ye, keça Cihangîr Şah, padişahê Xarezimê ye, ku niha çûye nêçîrê û dê di demek nêzîk de vegere:

Ey bax ezîz Hûrîliqa hen

Ferzendê ezîz Cihangîr Şah en

Çiyen ve şikar mahê cîhantab

Ha wext in beyû mah agitab (Ahengemijad &, Perwîzî, 1390: 39)

Ji ber vê jî divê ji baxçeyî derkeve. Le Berzû jê re dibêje ku bêyî dîtina keça padişahî, terka baxçeyî nake û naçe. Gava ku Hûrîliqa ji nêçîrê vedigere û Berzû dibîne, silavê dide û xêrhatina wî dike û wî vedixwîne koşka xwe. Li koşkê, ji Berzû re meclîsekê saz dike û bi hev re dest bi vexwarinê dikin:

Yawa ve nizîk şêrê dilawer

Silam da ne rûy Berzû şêr ejder

Berzû wat eleyk qîbley yeqînim

Yarê dilnewaz xorşîd cemînîm

Liqa wat ciwan xweş amay ve çem

Balat menîrim ve ban dîdem (Ahengemijad &, Perwîzî, 1390: 41)

Di vê meclîsê de Berzû û Hûrîliqa evîndarî hev dibin.

Banû mesê eşq Berzû mesê çem

Îd çûn perwane, ew çûn şûley şem (Ahengemijad &, Perwîzî, 1390: 43)

Berzû û Hûrîliqa şeva xwe bi hev re derbas dikin, lê berî razanê, Berzû şûrê xwe dikişîne û dixê navbera xwe û Hûrîliqayê. Dadoya Hûrîliqayê xeberê jî Cîhangîr Şah re dişîne. Padişah, Berzûyî gazî cem xwe dike û dibêje amade ye ku keça xwe bide wî, lê bi şertekî: kuştina ejdehayê Xarezmê. Berzû jî şertê padişahî qebûl dike:

Liqa medem pêt ve şert îqrar

Namerdan mebûn bê qewl û qerar“

“Berzû wat ey şah Xarezmî diyar

Herfit qebûl in ve şert îqrar (Ahengemijad &, Perwîzî, 1390: 56)

Roja din Berzû xatirê xwe ji Hûrîliqayê dixwaze û ji bo kuştina ejdehayî dikeve rê û bi vî awayî firaq di navbera aşîq û maşûq de dest pê dike:

Des kerd ve gerden Liqay wefadar

Watiş nazenîn Xuda nîgehdar

Himmetxwahî kird ve Hûrîliqa

Liqa zarî kird rû kird ve bala

Wat Berzû biçû Yezdan yarit bû

Firêştay firset nigadarit bû (Ahengemijad &, Perwîzî, 1390: 59).

Piştî gelek serpêhatî û zehmetiyan, Berzû ejderhayî dikuje û vedigere cem dildara xwe. Padişah jî soza xwe bi cih tîne û keça xwe dide wî û wusleta aşîq û maşûq pêk tê:

Şah des Berzû girde bî ve des

Wezîr hem awerd Liqay dîdemes

Cîhangîr çenî wezîrê pir fam

Des ve des kirdin du şoxê behram (Ahengemijad &, Perwîzî, 1390: 73-74).

Lê piştî mehekê Berzû maşûqa xwe berdide û ji bo ku peywira xwe, girtina Puladwendê Dêw, bi cih bîne, dikeve rê û dîsa firaqa wan dest pê dike. Xala girîng ev e ku êdî di destanê de qet behsa Hûrîliqayê nayê kirin. Tenê di destana

Teymûrnameyê de hatiye gotin ku piştî çûyîna Berzû Hûrîliqa di derd û êşa firaqê de rojên xwe derbas dikir:

Daîm pey Berzû her ne zarî bî

Şevan waweyla bê qerarî bî (Lutfinia, 1400: 54).

Ji neh meh û neh rojan şûnde Hûrîliqa kurekî tîne dinyayê û navê wî dike Teymûr (Lutfinia, 1400: 54). Li gorî destana Cewahirpoş, destaneke din a Şahnameyên Kurdî jî Teymûr dema mezin dibe, bêyî ku bizane bavê wî kî ye, diçe bi Rustem re şer bike, lê têk diçe. Rustem dixwaze wî bikuje. Wê gave Hûrîliqa ku rûyê xwe veşartî derdikeve meydanê, rûyê xwe vedike û xwe dide nasîn û dibêje ku Teymûr kurê Berzû ye (Behramî, 1383: 226).

Di rîwayeta Berzûnameyê de gava ku Berzû dikeve rê da ku peywira xwe bi cih bîne, bi dêwan re şer dike û birîndar dibe. Qerlanê hespê wî, wî tîne baxçeyê Mihrê Cihansozê Sîmîn Uzar, keça Efrasiyabê tûranî. Gava ku Mihrê Cihansoz Berzûyê birîndar dibîne fermanê dide ku wî derman bikin. Birînen Berzû derman dibin lê Berzû aşîqê Mihrê Cihansoz dibe, Mihrê Cihansoz jî evîna wî qebûl dike û bi vî awayî Berzû û Mihrê Cihansoz mehekê bi hev re derbas dikin:

Aşîq bî ve eşq cemînê alaş

Heyran mende bî we şîrîn balaş (Ahengernijad &, Perwîzî, 1390: 103).

Velhasil Berzû ta wadey yek ma

Ne êyş noş bî şêrbeçey şeca (Ahengernijad &, Perwîzî, 1390: 107).

Lê piştî demekê Berzû dixwaze biçe nêçîrê. Mihrê Cihansoz jê re dibêje ku nikare ji wî dûr bimîne û tehemula firaqê bike, lê Berzû guh nade wê, xatira xwe ji wê dixwaze û dikeve rê “(Ahengernijad &, Perwîzî, 1390: 113-114). Berzû di pêvajoya serpêhatiyên xwe de rastî gelek zehmetîyan tê û dîl dikeve, bi dêw û cadû û artêşa tûranî re şer dike û dîsa dîl dibe. Lê di dawiya destanê de piştî şerekî mezin, di nav Îran û Tûranê de, lehengên îranî bi ser dikevin, Berzû rizgar dibe û dîsa digehije maşûqa xwe Mihrê Cihansoz. Key Xusrew, padişahê Îranê, fermanê dide ku bila dawetê mezin amade bikin û Berzû û Mihrê Cihansoz digehijin hev” (Ahengernijad &, Perwîzî, 1390: 356-361).

Wekî tê dîtin, di serpêhatiyên evînî yên Berzû de jî, leheng pir hêsan aşîq dibe. Bi hêsanî “wuslet” jî bo wî pêk tê. Bi heman hêsaniyê dikare maşûqa xwe bihêle û jî bo peywireke “gîrîngtir” terka wê bike. Leheng dikare careke din evîndarê keçeke din bibe û piştî demeke kurt wê jî bihêle û biçe dû peywira xwe. Di dema firaqê de qet ji derd û êşa firaqê gazinan nake û di dawiya serpêhatî de jî dîsa digihêje maşûqa(ên) xwe û wuslet ji nû ve bo wî pêk tê.

Encam

Wekî hat dîtin di destanên Şahnameyên Kurdî de serpêhatiyên evînî yên lehengê mîtolojîk/destanî mijareke berbelav e ku ji aliyê şairan ve hatiye vegotin.

Lehengê mîtolojîk/destanî di serpêhatiyên xwe de aşiq dibe û evîna wî dikare bibe mijara firaq û wusletê. Di eslê xwe de, wekî li jorê jî hat nîşandan, serpêhatiya evînî ya lehengî jî xwedî hemî merhaleyên serpêhatiyên evînî ye. Lehengê mîtolojîk/destanî qonaxên hevdîtin, evîndarbûn, firaq û wusletê tecrube û derbas dike. Lêbelê tê dîtin ku berevajî “evîn”ên klasîk ku her behsa derdê firaq û hîcran û dûrbûn/dûrmayîna ji maşûq tê kirin û tê de “wuslet” wekî merheleyekê ku ne gengaz e aşiq bikare xwe bigehîne, di serpêhatiya evînî ya lehengî de, “wuslet” dikare bi hêsanî pêk be. Bi gotineke din, ji bo lehengê mîtolojîk/destanî du têgehên bingehîn ên evînê, yanî wuslet û firaq, xwedî wateyeke cuda ne û pîvana dereceya heqîqîbûna evîn/hezkirinê, ne êşa firaq/hîcranê ye.

Lehengê mîtolojîk/destanî bi hêsanî aşiq dibe. Leheng jî bo pêkanîna wusletê têdikoşe, hewl dide û di dawiyê de dikare bi hêsanî xwe bigehîne maşûqa xwe. Lêbelê xwestek û daxwaza “wuslet”a lehengê mîtolojîk/destanî ne hesteke platonîk e. Di rîwayetên behskirî de, bi zelalî dikare bê dîtin ku berevajî evînên “klasîk”, xwesteka “wuslet”a lehengê mîtolojîk/destanî hesta şehwetê jî dihewîne. Lê “wuslet”a leheng û maşûqa wî hertim di çarçoveya exlaq û edetên cîvakî (xwazgînî, dawet û hwd.) de pêk tê.

Di heman demê de lehengê mîtolojîk/destanî piştî “wuslet”ê jî dikare bi hêsanî, ji bo peywireke pîroz, maşûqa xwe bihêle û qet ji firaqê gazinan neke. Ji ber ku ji bo lehengî, evîn tiştek/mijareke şexsî ye û ji ber vê jî ne pîroz û ne îdealîzekirî ye. Tarîxa rîwayetên destanên lehengî-evînî yê coxrafiyaya kurdan nîşan dide ku ji destanên berî îslamê heta destanên ku di Şahnameyên Kurdî de hatine vegotin, di warê evîn, wuslet û firaqê de heman pêvajoyê dewam dike û tu carî merheleya firaqê heta mirina aşiq û maşûqê dewam nake û wuslet hertim pêk tê. Evîn jî bo lehengê mîtolojîk/destanî yê kurdan ne tiştekî pîroz e lê serpêhatiyekê lazim e. Ji ber ku leheng jî berî her tiştî “însan”e û dixwaze hez bike û bê hezkirin. Ji bo lehengê mîtolojîk/destanî evîn sehayekê şexsî ye û ne sehayekê neteweyî ye. Ji ber vê jî leheng tê de dikare maskeyê xwe yê lehengiyê rake, wekî însanekî jirêzê tevbigere û carinan bibe egoîst û bêhest. Di heman demê de aşiqbûn û pêkhatina wusletê ji bo rîwayetên mîtolojîk/destanî lazim e, ji ber ku dibe sebebê serpêhatiyên nû û jidayikbûna lehengên nû. Çawa ku hat dîtin ji evîn û wusleta Zal û Rûdabeyê, Rustem tê dinyayê, ji evîna Rustem û Tehmîneyê Suhrab û Feramez tîne dinyayê, ji evîna Rustem û keça Mesîhayê Abidê Cîhangîr tê dinyayê û ji evîna Berzû û Hûrîliqayê jî Teymûr tê dinyayê û her yek ji wan dibin lehengên destaneke nû û xwedî serpêhatiyên nû.

Çavkanî

- Abdullaeva, F. (2012). Woman in the Romances of the Shahnama, di *Love and Devotion: From Persia and Beyond*, ed. S. Scollay, Melbourne & Oxford: Macmillan Art Publishing, rr. 41-45.
- Abrams, M.H., Harpham, G.G. (2012). *A Glossary Of Literary Terms*, tenth Edition, Boston: Wadsworth.
- Ahengermijad C. & Perwîzî, Q. (1390) *Berzûname*, Kirmanşah: Baxê Ney.

- Akbarî Mafaxir, A. (1401). Negahî No bê Edebiyatê Hemaşî der Îran, di *Pejûhişhayê Zebanî ve Edebiyatê Karbordî*, Danişgahê Wilayetê Îranşehr, Dufesname ye texessusî, sal 1, şomarê 2, Payîz-Zimistan, rr. 1-30.
- Alimoradi, M. & Eşrefzade, R. (1398). Meşûqê Pehlewan, Bazşenaxtê Sûretê Duganeyê Kohenolgûyê Perî der Teqabol ba Şêş Şexsiyetê Hemaşî, *Pejûheşnameyê Edebê Xenayî Danişgahê Sîstan ve Belûçîstan*, sal 17, şomarê 33, rr. 209-232.
- Athenaeus (2010). *The Learned Banqueters (Deipnosophistae)*, Book 12-13.594b, ed. & trans. by S.D. Olson, London: Harvard University Press.
- Baldwin, J. (1985). *The Price of the Ticket: Collected Non-fiction 1948-1985*. New York: St. Martin's/Marek.
- Basirizadeh F. & Raoufzadeh, N. & Zaheri Sh. (2020). The Image of Woman in Eastern and Western Epic Literature, *BIRC Journal*, Vol. 3, No. 2, rr. 768-776.
- Battesti, T. (1400). *Zen der Şahname*, amd. A. Effî, Tehran: Mahrîs.
- Behramî, Î. (1383) *Şahnameyê Kurdî*, cîld 1, Tehran: Hîrmend
- Behramî, Î. (1389) *Şahnameyê Kurdî*, cîld 2, Tehran: Hîrmend.
- Bierce, A. (1911). *The Devil's Dictionary*, Cleveland & New York: The Worls Publishing Company.
- Boyce, M. (1955). Zariadres and Zarêr, di *Bulletin of the School of Oriental and African Studies*, University of London, Vol. 17, No. 3, rr. 463-477.
- Campbell, J. (1962). *The Masks Of God Volume II, Oriental Mythology*, London: Secker & Warburg.
- Coyajee, J.C. (1371). *Pajûheşhayî dar Şahname*, wergera bo farisî: C. Dûstxah, Tehran: Neşrê Zende Rûd.
- Ctesias (2010). *History of Persia, Tales of the Orient*, by L. Llewellyn-Jones & J. Robson, London & New York: Routledge.
- D'Avril, A. (1888). *Les Femmes dans L'Épopée Iranienne*, Paris: Ernest Leroux.
- Dostoyevsky, F. (1967). *The Brothers Karamazov I*, tra. C. Garnett. London: Heron Books.
- Gurganî, F.E. (1377). *Vîs û Ramîn*, amd. M. Rowşen, Tehran: Seday-I Mu'asie.
- Frazer, J.G. (1910). *Totemism & Exogamy*, Vol IV, London: MacMillan and Co.
- Frye, N. (1990). *Anatomy Of Criticism, Four Essays*, With a Foreword by Harold Bloom, Tenth printing, Princeton and Oxford: Princeton University Press. xs
- Hardie, P. (2019). Ancient and Modern Theories of Epic, di *Structure of Epic Poetry, Volume 1: Foundations*, Ch. Reitz & S.Finkmann (ed.), Berlin/Boston: De Gruyter.
- Hemzeyî, F. (amd.) (1393) *Rezmname, Ustûrehayê Kuhenê Zagros*, bexşê 2, cîld 2, Kirmanşah: Întişaratê Danişgahê Razî.
- Hidayet, S. (1377). Çend Nukte derbarê Vîs û Ramîn, di *Vîs û Ramîn*, amd. M. Rowşen, Tehran: Seday-I Mu'asie.
- Hillman, J. (1987). *Anima, An Anatomy of a Personified Notion*, Texas: Spring Publications Inc..
- Lescot, R. (1942). *Textes Kurdes, Deuxieme Partie, Mamê Alan*, Beyrouth: Institut Français de Damas.

- Lewis, C.S. (1960). *The Four Loves*, London: Geoffrey Bles.
- Lutfinia, H. (1399). *Şanamey Kurdî*, bergî duhem, Seqiz: Pexşankarî Bîryar.
- Lutfinia, H. (1400). *Şanamey Kurdî*, bergî sêhem, Seqiz: Pexşankarî Bîryar.
- Mewlana Celaleddîn (1389). *Mesnewî yê Me'newî*, amd. T. Subhanî, Tehran: Ruzene.
- Minorsky, V. (1946). *Vîs û Ramîn, a Parthian Romance*", *Bulletin of the School of Oriental and African Studies*, University of London, Vol 11, No. 4, rr. 741-763.
- Mokri, M. (1966). *La Légende de Bîzan-U Manîja*, Paris: Librairie Klincksieck.
- Neqşibendî, S.E., Kazzazi, M.J., Dawudabadi Farahanî, M.A. (1393). Nigahî be Şahname- Sorayî ve Rezmname-Sorayî der Edebê Kurdî ve sanjesh an ba Shahname Firdewsi, di *Faslname Ilmi Pajuheshi Zaban va Edeb-e Farsi-Daneshkade Edebiyat va Zabanha-ye Khareji Daneshgah Azad İslami vahed Sanandaj*, sal 6, shomare 18, Bahar , rr. 149-166.
- Oremarî, M. (2002). *Beyta Rustemê Zal*, di *Beytên Kurdî*, amd. M. Abdulla, Hewlêr: Wezaretî Perwerde, rr. 111-171.
- Platon (2018). *Şölen-Dostluk*, çev. S. Eyüboğlu-A. Erhat, İstanbul: Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları.
- Raglan, L. (1956). *The Hero, A Study In Tradition, Myth and Drama*, New York: Vintage Books.
- Russell, B. (1948). *The Conquest of Happiness*, 10. Imp., London: George Allen & Unwin Ltd.
- Schelling, F. (1989). *The Philosophy of Art*, ed. and trans. D. W. Stott, Minneapolis: University of Minnesota Press.
- Sefa, Z. (1363). *Hemase Sorayî der Iran*, ez *Qedîmîterîn 'Ehdê Tarîxî ta Qernê Çedardehomê Hejrî*, Çapê 4, Tehran: Entezaratê Emir Kebîr.
- Shahbazi, Sh. (2002). *Rudâba*. <https://iranicaonline.org/articles/rudaba>
- Şemsê Tebrîzî (1369). *Meqalat*, amd. M.A. Muvehhid, Tehran: Xarezmî.
- Stendhal (1891). *De L'amour*, Paris: Calmann Lévy.
- Stuhlmann, G. (1987). *Aliterate Passion: Letters of Anais Nin & Henry Miller, 1923-1953*. San Diego New York London: Harcourt Brack Jovanovich Publishers.
- Vaccha, P.B. (1950). *Firdousi and The Shahnama*, Bombay: New Book Co., Ltd.
- Vali, Sh. (2021). *Şahnameya Kurdî, Rustemê Zal û Heft Xana Wî*, İstanbul: Avesta.
- Vali, Sh., Ölmez, C. (2022). *Kesayet û Heyberên Mîtolojîk di Edebiyata Goranî/Hewramî de*, di *Mîtos û Edebiyat, Mîtosên Kurdo-Îranî di Edebiyata Kurdî de*, ed. Sh. Vali- K. Subaşi, İstanbul: Nûbihar.
- Vali, V. (1369). *Zen der Edebiyatê Hemasî İran*, di *Heyatê İctimaî Zen der Tarîxê İran, cîl I, Qebl ez İslam*, Kolektîf, Tehran: Emîr Kebîr, rr. 169-226.
- Xaleqî Mutleq, C. (1369). *Bîjen û Menîje ve Vîs û Ramîn*, Muqeddemeî ber Edebiyatê Partî, di *Îranşinasî*, şomarê 6, Tabistan, rr. 273-298.
- Xaleqî Mutleq, C. (1381). *Enasorê Dram der Bexî ez Dastanhayê Şahname*, di *Tenê Pehlevan ve Revanê Xeredmend de*, Meskoob, Sh. (ed.), Tehran: Tarhê No.